# MEHMED UZUN GIRÎNGIYA DENGBÊJIYÊ Di "ROJEK JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNIKÊ"

Di romanên tirkî de Kurd mîna kesên hov, nezan, paşket, bêbext û çiyayî dihên şirovekirin.
Lê di romanên Uzunî de tersî wê... Egîd Beg hevkarê dijmin, bêbext û hîlebaz e.

**23/04/2010 - 22:01**



**1:1** **1:1,2** **1:1,5**

Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" ji aliyê Weşanên Welat û Dozê ve li Stockholmê û li Stambûlê hatiye weşandin. Roman 163 rûpel e.

Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê romaneke allegorî ye. Wî bi vê romanê, wêjeya devkî û klasîk bi ya nivîskî ve girêdaye. Uzunî bi qayde û awayê wêjeya Mezobotamî ya kevn, mîna destana Gilgamişê nivîsîye. Ew qiral bû, lê Evdalê Uzunî dengbêj e, ew ne tenê dengbêjê Kurd e, ew dengbêjê gelan e (di romanê de); Evdalê Zeynikê Uzunî hem dengbêjê Kurd e û hem jî yê Ermenî û Suryaniyan e. Em bi xwendina vê romanê, dîroka kilam û stranên xwe, dildar û evîndarên xwe, wargeh û edetên xwe, başî û xirabiyên xwe hîn dibin.

Mehemed Uzunî bi eşq û evîneke mezin romana "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê"nivîsîye; ji xwe eşq û evîna mezin nebe, romana kurdî nayê nivîsîn. Ev roman mîna "Bîra Qederê" romaneke mezin e. Bi alîkariya vê romanê wêjeya devkî milê xwe dide wêjeya klasîk û wê xurtir û saxtir dike. Di romanê de sê evîn hene, ew ji ev in: Evdal û Gulê, Siyabend û Xecê û Bengîn û Meyro, ew sembolên duh, îro û pêşerojê ne.
Maruf YILMAZ

from
http://www.ufkumuz.com/6630_MEHMED-UZUN-GIRNGIYA-DENGBJIY-Di--ROJEK-JI-ROJN-EVDAL-ZEYNIK--.html